Di encama şerê çekdarî de li ser daxwazên ku ji Tirkiyê tên, ji 1993an û şûn ve PKKê 3 caran agirbest danezan kir. Ev gavên ku ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd hatin avêtin, rasti pênûs û astengiyên derûdorên rentxwir hatin. Di 9ê Cotmeha 1998an de di encama hevaniyeke ku bi hevkariya hêzên navnetewî hat amadekirin, Ocalan neçar ma ku ji Suriyê derkeve. 9ê Cotmehê de Ocalan dema dest bi rêwîtiya ber bi Ewrûpa kir wê wiha bigota: Ez ji niha û şûn ve dixwazim rola xwe di kanala siyasî de bilîzim. Ocalan dema li İtalya bû gelek caran bangên ji bo aştiyê kirin lê belê ji Yekîtiya Ewrûpa hêviya ku dikir bi dest nexist. Ocalan di 2yê sibata 1999an de bi zordayîna Yewnanîstanê heta Kenyayê diçe. Di 15ê sibata heman salê de ji li paytextê Kenya Nayrobiyê li pêşiya avahiya sef aretxana Yûnanistanê bi hevanîyeke navnetewî ber bi Tirkiyê ve tê revandin. Serokê gîştî yê PKKê Ebdullah Ocalan li girava İmralî ya li nav derya Marmarayê bi tenê li serê xwe di girtigehê de hat bi cihkirin. Ocalan li İmralıyê bi parêznameya xwe ya pêşî de daxwaz kir ku pirsgirêka kurd li ser bingeha aştiyê were çareserkirin.

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Yekem Car Ez Sînorê Navbera Du Dewletan Derbas Dikim; Her Du Alî Jî Kurd In

Serdana Piştî 15 Salan / Çavdêriyên Deh Rojan

Helîm Yûsiv

Roj 20.12.2015 bû. Ji Silêmaniyê, serê sibehê zû, min xatir ji hevalê xwe Fethullah Huseynî xwest û min berê xwe da aliyê Duhokê. Li wir hevalê min ê rê Ehmed Huseynî li pêşiya min bû, da ku em bi hev re herin ber bi avê ve, ber bi Sêmalka ve û di wî derî re em derbasî rojavayê Kurdistanê bibin. Bi rê de kelecaneke mezin ez girtibûm. Di dawiya sala 1999'an de min sînorên welêt li pey xwe hiştibûn û li Almanyayê bi cih bibûm. Tevî şopandina min a rojane ji rewşa Rojava re, her dîmenên ku di serê min de diçûn û dihatin ew dîmenên kevin bûn, ewên ku gava ez li wir bûm. Bi vî awayî her guhertina ku di van pazdeh salan de qewimîbû ji bo min nû bû. Wê ev guhertin çawa ji nêzîk ve xuya bibin, vê pirsê ez gelekî mijûl dikirim. Demjimêr derdora yanzdehê sibehê bû em gihîştin ber avê. Yekem car bû di jiyana min de ku ezê sînorê di navbera du dewletan de derbas bikim û her du aliyên sînor kurd in. Her du dewlet êdî bi termolojiya kurdan ne Iraq û Sûriyê ne, belê Başûr û Rojava ne. Li aliyê Başûr gava em ber bi nivîsgeha berpirsiyarê wî alî ve çûn xortekî nûhatî ber bi me ve hat û xêrhatineke germ li me kir. Ji Ehmed Huseynî re bi germayî got:

- "Kerem bike mamoste, kerem bike" û cihê rûniştinê pêş me kir. Gava herdu pasaportên me ji dest me girtin û derbasî cem yê berpirsiyar bû, Ehmed bi kêf li min zîvirî:

- "Na, na, rewşa me baş xuya ye." Lê bi derbasbûna me ya cem yê berpirsiyar re û bi awayê pirskirina wî re hat xuyakirin ku rewşa me qet baş xuya nake. Yê berpirsiyar pasaportên me yên Ewropayî di nav destên xwe de qulipandin û pirsên bi vî awayî kirin:

- Tu çi karî dikî?

- Tu karê siyasî dikî yan na?

- Tuyê biçî Rojava çi?

Gava ku carekê û diduyan pirsa xwe ya di derbarê kar de dubare kir, hevalê min bi pistepist got; ku wî em naskirine û ezê jî bersiva ku li bendê ye jêre bêjim. Ehmed wisa bêyî ku guh bide madtirşiya wî, bi zelalî jêre got:

- Ji bilî ku ez helbestvanekî kurd im, ez û hevalê xwe yê nivîskar em bernameyan jî di Ronahî TV de çêdikin.

Yê berpirsiyar serê xwe hejand û wekî ku bêje; jixwe li benda vê yekê bûm, ji me re got:

- Kerem bikin derve, emê bersivê bidin we.

Em ji nivîsgeha yê berpirsiyar derketin û li benda bersivê man. Herdu pasaportên me di nav destên wan karmendên basî oda kêlekê bûn. Di wê navberê re heta yê zabit dest bi lêpirsînê kir, dora du demjimêran di ser gihîştina me re derbas bibû. Piştî danûstendin û pirs û bersivan got; nabe hûn derbas bibin. Divê hûn erêkirinê ji Dîwana Serokatiyê bînin û talîmat wiha ne. Bi vê gotina wî re min hêviya xwe ji derbasbûna sînor birî û ez bêdeng mam. Ehmed dest bi pirsan kir û xwest yê zabit nas bike. Paşnavê wî Mizûrî bû. Jê pirsa hebestvanê kurd Ebdurrehmanê Mizûrî kir û ketin nav axaftinên cihê. Di encamê de, yê zabit got; ku hûn dikarin vê carê derbas bibin, lê careke din bê destûrwergirtin ji Dîwana Serok nabe hûn derbas bin. Me pasaportên xwe ji dest yê zabit girtin û mîna du çêlikên çûkan yên baskokirî ku ji devê pisîkekê bifilitin, me çenteyên xwe hilgirtin û em ber bi hêlîna xwe ve, ber bi aliyê Rojava ve bilez çûn. Li ber avê em pêrgî Mihemed Mîro bûn, ku endamekî Rêxistina Yasa ya Hiqûqî ye. Li ber avê em bi hev re li qeyika biçûk siwar hatin. Qeyikê ji Başûr di çend xulekan de em birin aliyê Rojava. Li wir Mihemed Mîro xatir xwest û çû Dêrikê, wisa jî du sê xortên nûhatî ber bi me ve hatin û pêşwaziya me kirin:

- "Hûn bi xêr hatin Rojava." Em li erebê siwar kirin û berê me dan cem birêveberiyê. Li oda birêveberiyê du rojnamegerên din yên biyanî jî hebûn. Bi pêşwaziyeke germ û bi rêzgirtineke mezin me dora demjimêrekê li wir qedand, hetanî ku biraziyê min Bengîn ji Amûdê giha cem me. Pilan wiha bû ku yekem cihê ku em herin serdana wî li Rojava goristana şehîdan be û gora Helebçê (keça hevalê me yê kevnar Taha Xelîl) be. Bi rê de min Taha agahdar kir ku wê baş be eger ew dora demjimêr çar li ber deriyê mezerê şehîdan li benda me be. Ew şehîdên ku ji me re riya vegerê vekirin, ewên ku hetanî em li jiyanê bin emê deyndarên wan bin. Bi dîtina wê axê re, wan rê û rêçikên direj û tozgirtî re, bi dîtina wan erdên berfireh û wan asoyên vekirî re, kela girî kete qirika min û

ji kursiyê tirimpêlê ya paş ve yê îskeîska Ehmed Huseynî ku nikarîbû veşêre zor da hêsirên min û giriyekî bêdeng qurmê zimanê min girêda. Berî pazdeh salan dema min pişta xwe da vê axê, min digot; ezê vegerim ne ji bo careke din li ser vê axê bimeşim, lê ji bo ketina bin axê. Vegereke wisa ku alên kesk û sor û zer li ser vê axê bilind bin û ne mirî, sax û serbilind vegerim, ne tenê xewn bû, belê tiştekî ji xewnê bi wêdetir bû. Vaye ew xewn dibe rastî û serbilind vedigerim welatê xwe. Ev yek zêdeyî taqeta min bû û tenê hêsiran dikarîbû vî agirê di giyan û dil de vêketî sivik bike. Dêrikê, Girkêlegê, Tirbesipiyê û ...gelek gund û bajarokên din me li pey xwe hiştin û em ji Qamişlo, ji wargeha hezkiriyên jiyanê nêzîk dibûn.

(....wê bidome)

Hinek Dikin û Hinek Dixwin

Refîq Îbrahîm

Di nava zêdî çar salan de ji qîrana Sûryê gelek tişt derketin hole, gelek wêne di ber çavan re derbas bûn bandora xwe li ser Kurdên Rojava lîst çi bi başiyên xwe, çi xerabî li rewşa devera me kir. Ji hêlekê ve gava rêcîma desthilat di deverên Kurdan de bû hemû lîskê xwe yên qirêj bikar tanî, her tişt ji xwe re helal dikir eşkence, zordarî, bi rengekî berbiçav û eşkere li ser gelê Kurd dida meşandin, gelek astengî jê re çêdikirin ta ku nikaribe tev bilive.

Çi yekî Kurd serî radikir bi xiyanetê tewanbar dibûn, dihatin binçavkirin, hetanî bi zimanê zikmakî qedexe bû. Karê partiyan û siyasetê karekî pirzor bû bi dizî dihate kirin. Yê ku di nav lepê recîmê ketya vegera wî pir zehmet dibû, ji ber tiştê di zindanê de dibû nayne ziman, di wê demê de Kurdên deverê wek kerîkî bê şivan bûn, wey li wî be yê ku xwe ji peşkê pîsya bazdaya.

Ji ber dijminekî bê bext û bê wijdan û bê ol bû. ji destpêkê de şoreş derbasî bajarê Kurdan bû Kurd ji her kesî bêtir xwedî lê derketin. daketin kolana dijî kiryarên rêcîmê bi rengekî aştyane bi siloganê azadî, valakirina zindana, wek hêvî, bidestxistina mafê gelê Kurd. lê mixabin gelek ji wan kesên ku li ser piya bang dikirin qaşo serkêşya xwe pêşandana dikirin li gorî bercewendiyên xwenî teng kar û xebatê xwe kirin gel xapandin armancê xwe bi cî anîn ew hiştin yeko yeko bazdan.

Her tişt li paş xwe hiştin henekê xwe bi milet kirin, bi kolanê dewleta ketin xwe kirin opzisyon. Lê birastiya herî başî berbiçav ku beşê herî pir ji Kurdan zanibûn şiyarbûn xwe amade kiribûn biryara xwe stendin çi dibe bela bibe lê devrê Kurdî xerab nebin, kuştin çênebe bajar wêran nebin, talan nebin xeta sêyemîn ji xwe re hilbijartin ji bo pirsgirêkê xwe çareser bikin li gorî xwesteka gel gavê xwe avêtin sazî û navendên xwe ava kirin gel bi rêxistin kirin, ev yek bû cihê dilxweşyê û rêzgirtinê.

Hêza YPGê ava kirin ta ku karibin parastina Rojava bi giştî bikin. Bi rastî jî di demeke kurt de bû hêzeke serke di seranserê Sûryê de. Vê yekê hişt dijmin pir hesaba ji Kurdan bikin komên tîrolîst ji hemû deverên dûnyayê dan hev bi ser deverê Kurdî ve şandin da bajerên Kurdan kontirol bikin, lê xelkê Rojava li xwe bi xwedî derket li himberî van kiryaran berxwedaniyek bê hempa dane meşandin deng da seranserî cîhanê bi hezara qûrbanî di vê riyê de danîn serkeftinên dîrokî bi dest xistin ne lêşkerî bi tenê jî lê siyasî, abûrî, aramî, ...).

Ji alîkî din ve jî tevliheviya li Sûryê çêbû gelek kesan ji xwe re kirin armanca danheva pera û lêgerîna kursiya xwe kirin ber pirsê gel bi lîstokên genî xwe gihandin cihê ku dixwestin. Wekî em hemû dizanin gelek ji van kesan yê bi ro pê de xwe dikirin xwediyê milet yek ji zarokên xwe yan mirovên xwe li Rojava nehiştin. Bi roj pê de serê xwe bidestkevtiyê lehengên me mezin dikin.

Geleka ji wan hetanî berî çar salan eşkere recberya rêcîmê û kesê pê ve girêdayî dikirin. Ma gelo kengî ev hêza netewî bi wanre pey da bû ku bixwe hisyan ji nivşkêve bûn serkêş ku kesek nema dikare navê wan bîne ser zimana. Bela em di wê baweryê debin ku ev kesana wê hesab beware bê dîtin ewê ku bîna genî biwan ketiye ew jî baş xwe nasdikin. Çi kesê li ser xwîna şehîdan.

îro xwe kirine pêşeng wê deynê vê yekê ji wan bê stendin bela di xewin û xeyalan de nemînîn. Ji ber destkevtiyê bi xwîna pakrewanan hatine bicîkirin. Êdî çi kesên ji bo bercewendiyên xwe hatibe hatiye naskirin. Divê bên cezakirin çi yekî malê vê şoreşê xwaribe, dizîbe, teşqele pêk anîbe divê bê eşkerekirin li dadgeha gel bê cezakirin. Ma ne şerme yên wekî wan me dikin lîstok di nav destê xwe de wekî kerê dama me bibin û bînin. Na ez vê pirsê ji her kesê berpirsyar dikim da ku her kes li xwe vegere û li ser hesabê vî gelê perîşan xwe nexapîne bi êş û azarê wî bihise. Bela zanibin gelê Rojava gelekî fidekar e pir ji xaka xwe hez dike, mêr e, merd e, dil paqij e ji bo vê yekê divê em nehêlin ji me bê gûman bimîne. Yê ku nikaribe ji serê pozê xwe pê ve bibîne nikare tu kesî ji xwe pê ve bibîne, bê gûman ew ê nehêjabe li ser kursiyê rone yê ji dil û can kar û xebatê neke wê têkeve pir şaşityan de.

ev yek netê wateya ku kesin bi wijdan hene karekî pir bedew dikin lê ew kesana jî gelek pêdivyên jiyanê bêpar dimînin ji ber ji dilekî rast bi axa xwe ve girêdayîne. Ne wekî wan kesên bê wijdan yê ku li qebqeba dengê xwe digerin axetya berî 60 salî li ser gel bidin meşandin. lê ev kiryar nema tên qebûlkirin êdî xeta xwar divê em hemû li dijî wê bisekinin nema ji wan fedî bikin çimkî yê ku mafê min bixwe ez jî nema jê fedî dikim, jê jî natirsim çi şaşitî hebe divê bê eşkerekirin.

Ji ber yê li ser şaşitya nesekine rexnê xwe neke ne ji mafê wî ye yek gotinê jî bêje. Bela her yek bizanibe her kesê di cihê xwe de berpirsyar e di ber vî gelî de dê baş bi erkê xwe rabe. Çimkî yê ku di vê demê de şaşitya daqurtîne wê çaxê ew xiyanetê bi soza şehîdan re dike, xiyanetê bi xwîna wan re dike, bi hemû gelê Rojava re dike, bi axa Rojava re dike. Ji ber vê yekê divê em hemî yek dest, yek doz, yek deng ji dil û can berxwedanê bikin ta kes ji me bê par nemîne.

Gotarên Weşandî Nerînên Xwediyê Xwe Ne

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Pişti Ku Ferensa ji Sûriyê Bar Kir.. Çîroka Şewata Gundê Qezerecebê

- Ji Girê Vira Mîcer berê xwe da gundê Hinêwiyê dema ku gundiyan dît va Engilîz ber bi gund ve hatin dev ji gundê xwe berdan û revîn. Di wê revê de Remoyê Feqe xwest berevaniyê bike lê ew bi guleyê Engilîz hate kuştin (bavê Silo koro yê stiranvan)

- Di wê demê de mirov dikare bibêje gundê Heyaka wek paytexta Xiristiyanan bû.

- Germobîla Dêrika Hemko û gundewarê wê anîbûn qaqareş kesî ji ber wan nediwêrî bibêje ez musilman im.

- Dema ku navê Germobîla yan eskerê kumsor dihate gotin zilama xwe diveşart.

- Mîcerê Engilîzî berê Eskerî xwe û silahê giran da gundê Qezercebê û gund dorpêç kir lê beriya ku gund dorpêç bikin gelekan ji gundiyan baz dabûn.

Luqman Silêman

Gundê Qezercebê dikeve Rojavayê Dêrika Hemko, lê îro mirov dikare bibêje ku gund û bajar gihane hev.

Çîroka şewata vî gundî wek ku ji min re hatiye gotin ez jî ji xwendevanê Rojnameya Buyerpress re dinvîsim.

Li gor gotina hemwelatiyên deverê, dema ku Ferensa li Sûrî bi cî bû piraniya Xiristiyanên bajarê Dêrika Hemko û yên gundewarên wê destê xwe dane Ferensa û tevlî leşkerê wê bûn. Tê gotin ku di wê demê de Germobîl hebûn û Eskerê komsor jî hebûn û hemû ji Xiristiyanan bûn. Piştî ku Xiristiyanan xwe dan dora Ferinsiyan, ew bûne kom. Bêguman her yek ji wan mebestek wî hebû. Ya Xiristiyaniya da ku tola xwe ji Kurdan hilînin bi wê hêzê xwe radestî Ferinsiyan kirin ji ber ku wan digot fermana ku Tirka di sala 1915an de anî serê wan Kurdan kiriye ji lewma jî dîtin ku hatina Ferensa fersendeke ku ew tola xwe ji Kurdan hilînin û ya Ferensa jî da ku bihtir Xiristiyanan bi wan ve werin girêdan destê wan li deverê berdan. Berjewendiya herdû rexan rastî hev hatin, bê guman wê Kurd wek her car ardûyê van berjewendiyan bin.

Ji xwe di wê demê de wek pêngav piraniya Kurdan perîşan bûn, ji cotkarî, şivantî, û gavantiyê pê ve nedikirin yan tiştek dî ji destê wan dernediket ji pêvî wî karî. Hin xelkê Kurd xwestin dostaniyê bi Ferinsiyan re deyn in, ji xwe ne bi rengê ku Xiristiyanan dikir lê ew jî li ser tiliya dihatin jimartin û piraniya wan ji keya, axa û began bûn, lê ji rexê dî ve Ferinsiyan jî nas dikir ku tiştê Xiristiyanan ji wan re bikin Kurd nakin, ji ber ku Ferinsiyan giringiya Kurdan li herêmê de dizanî ew miletek in, û dozek wan heye lê Xiristiyan kêm netew in û piştgiriya wan Hevsengiya deverê bi wan nayê guhertin lê Kurd dikarin hevsengiya deverê biguharin ji lewma jî Ferensa pişgiriya Xiristiyanan kir û destê wan li deverê berda.Dema ku bi wî rengî Ferensiya, çavê xwe ji kiriyarê Xeristiyanan girt û dan û sitandinê Xirstiyanan yê xwebînî panîk kire dilê Kurdan. Kurd ketin bin nîrê panîkê ji lewma jî her yek di riya xwe re xwest têkiliyên xwe bi Xirstiyaniyan re xweş bike bi renegekî ji renga da ku xwe biparêze. Ji xwe di van pinvagên wisa de miletê bêserî hev nagire, û dibe parîkê hêsan. Xiristiyanan di riya rêgihê re dest bi Regezperistinê kirin û dûv re ber bi wê ranê ve ajotin û Ferensiyan jî Piştpêbestî li wan kir.

Di wê demê de mirov dikare bibêje gundê Heyaka wek paytexta Xiristiyanan bû, û herêma Dêrikê dihate dîtin. Wek Materyalê hene û ji min re hate gotin ku Xiristiyanan di wê demê de pir zilim û zor li Kurdan dikirin, û digotin ev delîveke ku em xwîna xwe li erdê nehêlin û tola xwe ji Kurdan hilînin. Ji ber ku wê demê û heta niha jî Xiristiyanan digotin û dibêjin Fermana Xiristiyanan ya ku di sala 1915an de bi serê wan hatî bi destê Kurdan bû ji lewma wan rayên dijminatî û tolhildana ji Kurdan re, di nav xwe de kûr dikirin û bi çavê dijminatiyê li Kurdan dimeyzandin. Bi bihane û bê bihane dixwestin Kurdan bikujin û zilim û pêstûriyê li Kurdan bikin. Diyar bû ku Ferensiyan ji reftarê wan razîbûn û dixwestin ku her rewşê di nav Kurd û Xeristaniyan de Gumreh bikin da ku temenê wan li deverê misogir bibe. Min hin kesê Ermeniyê wê demê dîtin beriya çend salan hîn ew li ser xwebûn wan jî ji min re nerazîbûnê xwe ji riftarê Xiristiyanan dane xuyakirin. Lê pirs dihate kirin ma gelo mebesta Xiristiyanan di wê demê de çibû? tenê dixwestin tola xwe ji Kurdan hilînin yan dixwestin Kurd ji deverê baz bidin ev ne diyar e!?.

Ji ber ku Ferensa destê wan li deverê berdabû, û ewan jî bi hemî rengî çavsorî li Kurdên perîşan dikirin. Di wê demê de bixwestan kî bikujin yan kî talan bikin yan jina kî jê bistînin dikirin û kesî ne diwêrî bêje ev çi ye!? Û bi sedan tiştê wisa kirêt di mafê Kurdan de dikirn. Ciyê ku bixwesta ji xwe re ava dikirin bê ku kes ji wan re bêje ev çi ye?. Kurdan bi hemî rengê xwe ji Xiristiyanan diparastin lê cardî jî ji zilim û pêstûriya wan xelas nedibûn. gund ji xwe re ava dikirn kesî nedigo ev çi ye. Eşkere digotin em ê tola xwe ji Kurda hilînin lê Ferensiyan ew deng nedibire xwe û destê wan digirt û çavê xwe ji kiryarê wan li dijî Kurda digirt.

Germobîla Dêrika Hemko û gundewarê wê anîbûn qaqareş kesî ji ber wan nediwêrî bibêje ez musilman im (wek ku tê gotin). Dema ku navê Germobîla yan eskerê kumsor dihate gotin zilama xwe diveşart.

Di nav Kurd û Xiristiyanan de pir nexweşbû, Xiristiyan Ferensa li pişta wan bû, û Kurd bê pişt bûn wek hercar û herdem Kurd bê pişt in û bê xwedî bûn vê zikreşiyê û nexweşiyê dom kir ta sala 1947an heta ku Ferensa ji Sûrî bar kir.

Dema ku Ferensa bar kir pênsed ji wan Germobîl û eskerê kumsor yên ku bihtir ji her kesî zilm û zor li xelkê devera Dêrika Hemko dikirn bi Ferensiyan re çûne Libnanê, xwestin ji wir jî herin Ferensa!. Pêştî ku Ferensî çûn devera Dêrikê ma bê Hikumet û êşa sal, serî rakir û kuştinê destpê kir kîna sala derkete meydanê ew ê ku Xiristiyanan zilm û zor li wan dikirin wan jî xwest tola xwe ji wan hilînin. li gor govanê wê demê ku ji min re hatiye gotin serî bûbû bi pîvazekê!.

Mitran Qiriyaqos mitranê Xiristiyanan bû, mala wî li Hesekê bû, û Keşe Efrêm mala wî li Dêrika Hemko bû. Gotina van li cem Xiristiyanan nedibû dido û bêyî wan tiştek nediçû serî dema ku van herdûyan dît rewş ber bi xirabûnê ve diçe berê xwe dane Libnanê çûn ji wan pênsed kesê ku ji Dêrikê çûbûn Libnanê û dixwestin herin Ferensa re gotin we xwe xilas kir hûn li pey pariya nanê xwe û jiyaneke aram ketin û we em hiştin ji kuştinê re li ber destê Musilmanan, ma hûn nizanin wê firmanek dî li serê me rakin heger hûn venegerin wê me hemiya bikujin. Ji ber ku herdû kes di nav civaka Xiristiyanan de xwedî şan bûn û gotina wan ne dibû dido her pênsed ji Libnan vegeran hatin. Di wê demê de piraniya Xiristiyanan dev ji gunda berdan, nexasim yê gundê Heyaka kes nema tev çûne Dêrika Hemko. Dema ku ew ji gunda çûn xelkê wan gunda malê wan talan kirin, nexasim Erebê wan gundê li dora Rimêlan û bi taybet Erebê ku bi Mîzerê Medlol ve girêdayî bûn, berê xwe dane gundê ku Xiristiyanan jê bar kirn, malê wan ji xwe re anîn.

Roj bi roj di nav Xiristiyanan û xelkê wê devrê de rewş ber bi nexweşiyê ve çû.

Zilamek hebû jê re digotin Hemîd Axa li Dêrika Hemko li ber deboya çekan bû, di dema Ferensiyan de û dema ku Ferensî ji deverê çûn ew çek hemî hiştin di deboyê de di bin destê Hemîdê axê de(sîlah). Li vir Kurdan xwest destê xwe deynin ser wan çekan û Xiristiyanan xwest destê xwe deynin ser. Tiştê ku Ferensiyan li şûn xwe hiştine, Xiristiyanan û Kurdan êrîş berdane ser deboyê. Hemîd Axa ji herdûyan re got: Hûn bi ya min bikin ez ê van çekê di mexzenê de li we par bikim yek bi yekî çêtir ku hûn li ser bi hev bikevin, Hemîd nexwest şer di nav Kurdan û Xiristiyanan de derkeve!

Herdûyan jî ji Hemîd Axa re gotin baş e!..

Hemîd Axa destpê kir yek parçek da Xiristiyanan û yek da Kurdan lê piştî ku Hemîd Axa çend parçe çek dane wan. Xiristiyanan Hemîd Axa kuştin û dest danîn ser deboya çek û rextên mayî, û hemî ji xwe re birin!!? Li vir em çi dikarin bibêjin, yan hîn Kurd ji wê tirsa Xiristiyanan azad nebibûn û yan nexwest kuştin çêbibe. Dema ku Xiristiyanan ev yek kir di nav Xiristiyanan û Kurdan de pir nexweşbû li Dêrika Hemko û li derdorê Dêrikê serî hate pîvazekê kesê ku sûda wan ji wê rewşê hebû ew agirê di bin tifikê de bihtir li hev xistin û agir gur kirin.

Mitran û Keşê zanîn ku rewş ber bi wêranê ve diçe ji lewma xwestin dengê xwe bighînin Engilîzan ji ber ku di wê demê de hîn Engilîz li Iraqê bûn.

Wê çaxê Melek Yaqo bavê Melek Zeya yê ku beriya çend sala berbijêrê perlemanê Sûrî bû ew Rawêşkarê Mîcer bi xwe efserê Engilîzî bû li Tilkoçer heyîn û neyî di destê wî de bû. Mitran Qiriyaqos û Keşe Efrêm çûne cem Melek Yaqo û jê re gotin heger tu tiştekî ji me re neke wê cardî Kurd fermana me rakin? Melek Yaqo mijar baş li hev hûnand û herdû jî bi xwe re birin çûn cem Mîcerê Engilîzî jê re gotin tu newê me xilas neke wê Musilman me qir bikin wê Fermana me rakin. Herdûyan ji Mîcer re gotin biveka mezin ji gundê Qezercebû ye û hin gundên din jî hene lê ew ne bivekin bi qasî xelkê Qezercebê!!.

Mîcer ji wan dipirse çima Qezerceb wisa ye ma kî lê heye û çi lê dibe?

Keşe Efrêm jê re got: Şêx Birahîmê Şêxê Dîn û Şêx Ebdile gundê Qezercebê ji xwe re kirine bingih û tê de xelkê fêrî dijîtiya ola Îsa dikin û kîn û dilreşiya di dilê xelkê de diçînin da ku dema bixwazin ji me xelas bibin milet li pey wan rabe. Herdûyan Mîcer kirin di dîmenekî de ku di van çend rojên bên de wê fermana Xiristiyanan li deverê dest pê bike. Gundê ku dixwestin wan bikin sosret ji deverê de navê wan dane Mîcer.

Mîcer ji wan re got: De hûn herin sibê ez têm.

Herdû ji xwe vegeran, roja dî Mîcerê Engilîzî Eskerê xwe anî pêşî bajarokê Dêrika Hemko dorpêç kir. Wek me got: wê çaxê Şêx Birahîmê Şêxê Dîn û Şêx Ebdile li gundê Qezercebê bûn. Di wê demê de gundê Qezercebê bi hejmar sê sed mal tê de hebûn. Xuya dike hebûna herdû Şêxan di gundê Qezercebê de giring bû ji Xiristiyanan re. Ji lewma Melek Yaqo û keşe Efrêm ji Mîcerê Engilîzî re gotin heger tu çavê wan bişkînî gerek tu ji gundê Qezercebê destpê bike, ji ber nexweşiya me ji gundê Qezercebê ye çimkî du Şêx tê de ne ew Musilmana li me har dikin û dixwazin ku fermanek dî bi ser me de bînin!

Mîcerê Engilîzî berê Eskerî xwe û silahê giran da gundê Qezercebê û gund dorpêç kir lê beriya ku gund dorpêç bikin gelekan ji gundiyan baz dabûn.

wê çaxê muxtarê gund Mistê Xencer bû. Yê ku di gund de man xwestin berevaniya gundê xwe bikin û li dijî êrîşkera şer bikin lê dema ku gundiyan çav li Engilîz kirin çawe bi çekê xwe yê giran ve tên, fam kirin ku wan barê Engilîz nîne ji lewma xwestin dev ji gundê xwe berdin. gundiyan baz da di bazdanê de çar mirov hatin kuştin yek ji wan bavê Osmanê Dibêsa û Qasimê Dibêsa bû û sê kes jî birîndar bûn!!. Çaxê ku xelkê gund revîn pê re negihan ku tiştekî ji malê xwe bi xwe re bibin ji cilê berbedena xwe pê ve tenê mala Yusivê Silo sewalê xwe birin û çûne serxetê wekî dî gund tevlî tiştê gundiyan û sewalê wan hemî hatin şewitandin. Ji Qezercebê Engilîz berê xwe dane gundê Girê Vira ew jî şewitandin û zilamek li wir jî hate kuştin navê wî Sofî Ebdile bû ew kulek bû nikarîbû xwe xilas bike kete ber guleyên êrîşkeran de. Ji Girê Vira Mîcer berê xwe da gundê Hinê Wiyê dema ku gundiyan dît va Engilîz ber bi gund ve hatin dev ji gundê xwe berdan û revîn. Di wê revê de Remoyê Feqe xwest berevaniyê bike lê ew bi guleyê Engilîz hate kuştin (bavê Silo koro yê stiranvan)stiranvanê meyî bi nav û deng. ji wir Mîcer berê xwe da gundê Girê Reş lê xelkê gund çûne pêşiya wî û paçikê sipî jê re hildan dema ku Mîcer dî va gundiyan paçikê sipî hildane wî jî dev ji wan berda û gund ne şewitand. Lê xelkê wan gunda bi destê zarokê xwe girtin û berê xwe dane sînorê serxetê lê Cendirmê Tirka jî hatin li ser sînor beramberî wan sekinîn da ku nehêlin kes derbasî Serxetê bibe. Xelkê ku ji gundê xwe bazdayîn sê roja li ber sînorê Serxetê li wê çolê man. Ewqas xelk man di nav du agiran de ji rexekî Engilîz e û li rexê dî jî Tirk in, ew xelk ketin derûniyek nayê pesindan.

Gundê ku Mîcer gotibû ez ê wan bişewtînim û ne şewitandin ev bûn.

Girzerk
Kanî Pehin
Gerdemî
Bacrîq
Girê reş

Ji xwe Qezerceb û Girê vira şewitandin

Wê çaxê mala bapîrê min bavê diya min li gundê Gerdemiyê bûn wan jî baz da çûbûn ser sînorê Tirkî diya min wê çaxê zarobû û gelek cara çîroka xwe ya ku weka xewnekî mabû di mejiyê wê de ji me re digot: çawe me ji malê baz da û çi hate serê xelkê wan gundan.

Ji navê Efserê Germobî û eskerê kum sor li gor gotinê xelkê wê demê yek jê Sercan Bihnan bû û yê dî navê wî Tûma..!

Di Riya Koçberiyê De (1-4)

Silêman Azer

Welat Bihuşta Min e

Piştî ku yezdanê gewre, bê hempa û yekpare fermana roja paşdawî da ye, hinga pêşmerge li bin sîtava daristanê, li ber himêza çiyan li hev civiyabûn, bi hev re şêwra yekgirtinê danîbûn, eniya xwe bi lat û zinarên welat dixurandin, û tovê omîdan bi xaka welat ya pîtdan wer dikirin.

* * *

Ji destpêka toşê ve min evsaneya welatê xwe di çar pişkan de bi hûrbînî xwendiye, ji berbanga dîrokê ve Zeradeştê pêxember sirûda nasnameyê ji navkutka xwerista pirdan û comerd, ji reng, deng û dîmenê zimanê dayikê afirandiye, li ber kêla nemirên nependî ayetên Zendavesta bo bêzaran kirine baz bend, ji sincên firiştiyane xampera pêwanê bihuştê, li ser tabloya paraztî navê Kurdistan nîvisandiye.

* * *

Welato: Li ser lêvên te mame stiraneke xemgîn, bûme kilçîvê herdû çavên hêsirdayî, bûme keziyeke veçirî li ser milê periyan berdayî, xum-xuma cobaran li nêv bax û zeviyan, li êmîşên dehlên te yên çêjer bûme mêvanekî xerîdar, bûme xaleke xawer li jora tîpên navê te, bûme peyrewiyekî xwedawendane li ber mêrava te, salixekî şeyda li ser nûçeyên geştyarekî eware, li dûv leylana te bûme gaziyeke dengirtî li benda hawara te.

* * *

Çelengiya te kirime dîlê evînê, biskeke şîlove li ser hinarkên rûyê te kirime evîndarê heyvê, bûme telpeke qetran li ser eniya mirovaniyê, bûme pirsgirêkeke aloz di gewriya dagîrkeran de, bûme razeke evra kaniyên terorîzmê ziwa dikî.

* * *

Kula min e ku zanibim tê bi kîjan zimanî nefretê bidî bextê minî likumî, tê bi kîjan zaravî jana bêdengiyê derman bikî, min li ser eniya xwe çiraxa evsaneyan daniye, warê te yê bihuştiyane li ser kolînka tarîewran terz û meşqe kiriye, li ser zendên xwe dîroka perçebûnê bi xîmava bextreşiyê dax kiriye, tenha ji bo ku razên yezdanê xwetenparêz, ji hemî zindîwarên gerdûnî re eşkere û bi têrutesel liba bikî.

* * *

Welato Qamişlo bûka şaran, cîwarê xoşewîst û lehenda şêran, çi bikim ku îro bêganeyên tundrew û nîjadperest lê bûne xwedî, û gelê Kurd şênewarê xaknîgariya resen lê ma ye mêvanekî sîgiran, çendî li zeviyên ziman yên kaleşûv paşaxa pyeva resen bikim tucar bi dawî nabî, çendî li nav gulîzarên şêwezariya zimanê mader paleya peyva hevwate, rewanbêje, civakî û wateguhêz bikim tucar gencîneya zimanê dîrokdêrîn vala nabî, lê her cîyê mixabinî ye zimanê ku bê sazî û kêmrêber her dimîne yadiyeke kulneder.

Mihemedê Seyid Husên

Gelo Ez Digirîm an Digîrim ?

Ferîd Mîtanî

Ger rêzimaneke hevbeş û erêkirî li nav me Kurdan hebûya, dê gelek afirandin û nûjenî biketa di denganî, watenasî û hêmanên ziman de .

Lê her çi qas gengeşe li ser nakokiyên rêziman werin kirin, di dawiyê de dê encam û bersiveke guncaw bête dîtin.

Mijara min di derbarê gotara Mamoste Fêrgîn Melîk de ye.

Di destpêkê de silav û spasiyên xwe pêşkêşî M.Fêrgîn dikim li ser şîrovekrina hin rêzikên rêziman, lê hin tîbîniyên min di derbarê çend xalan de hene.

Yek ji têbîniyan ew e ku Mamoste daye diyarkirin ku hemî lêkerên bi "în"ê diqedin negerguhêz in, lê ev rêgez ji hemî lêkeran re ne derbasdar e, ji ber ku hin lêker hene tevî ku bi "în"ê jî diqedin lê ew lêkerine gerguhêz in, wekî

(kirîn, birîn, dizîn û nivîsîn)

Mînak:Min sêvin kirîn.

Min darek birî.

A dudiwan di derbarê lêkera "girîn"ê de ye, Mamoste nivîsiye ku divê ev lêker wekî "gîrîn" di ziman de were rûniştin! Bi rastî ta niha min ev lêker di zar û nivîsên Kurmancî de nedîtiye. Ev lêker ku li gorî dema niha tê kişandin rayeka wê rêzder e û wekî "girî" dimîne da ku were cudakirin ji rayeka lêkera "girtin"ê, çaxa ku di demên borî de tê kişandin (a) yek li rayeka lêkerê tê zêdekirin bi mebesta ku were cudakirin ji forma dema niha.

Mînak:

Ez digirîm. (Dema niha)

Ez digiriyam. (Dema borî)

Gelek lêkerên din jî hene di demên borê de "a"yekê li xwe digirin da ku form û kêşaneke xweser bidin risteyê. Mînak:

Tu direviyayî / Tu dikeniyayî.

Di derbarê ketina "în"ê de ji rayeka dema niha, ez dikarim bibêjim ku çend lêkerên din hene wekî lêkera girînê bi tenê tîpa (n) ji lêkera raderîn dikeve û rayekê pêk tîne, wekî lêkera "jîn" rayeka wê dimîne"jî". Ger em li gorî rêgezê biçin divê ku tîpên lêkera "jîn"ê werin guhertin û hin tîpên nû lê bar bibin, di vê rewşê de em bêtir tûşî aloziyan tên û pirsgirêk jî nayê bişaftin; nerîna min ew e ku divê her lêkerên bi vî rengî "a"yekê di demên borî de li xwe bar bikin.

Divê ku neyê jibîrkirin ku her rêgezek rêzderên wê hene.

A sisiyan li ser çawaniya gerguhêzbûna vê lêkerê ye; jixwe lêkerên Kurmancî di avaniya tebatî de teşeyê gerguhêz werdigirin, ka em lêkera girîn di avaniya tebatî de bikişînin.

- Zarok hatin giriyandin.

Di mînaka jorîn de diyar dibe ku bi wergirtina paşgira"andin" û bi pêkhatina kelijandinê me lêkereke gerguhêz bi dest xist.

Rengdêriya vê lêkerê jî di raweya çêbwar de pêk tê .

Mînak: Zarokên giriyandî.

Di mînaka me de rengdêriya lêkerê jî pêk hat.

A çaran di derbarê wateya lêker an jî peyvê de ye. Mamoste dibêje ku rayeka lêkerê çaxa ku dimîne "gir" tê wateya girbûnê.

Wekî ku tê zanîn di lêkolînên watenasiyê de peyvin hene xudanê qadeke wateyî ya berfierh in, ango tu nakokî nîn in ger peyvek di nava xwe de gelek wateyan vehewîne û ger ev yek wekî pirsgirêk were nirxandin dêmek lêkera "girtin" jî nayê pejirandin, ji ber di rengê rayekîn de careke dî wateya "gir" dide me.

Xala dawîn ez dikarim bibêjim ku hemî lêkerên Kurmancî yên bi "g"yê dest pê dikin tîpa ku li dûv wan tê ne tîpa "î" ye, ji ber ku tîpa"g"yê tîpeke qirikî û girtî ye, tîpa "î"yê jî tîpeke nîvgirtî ye û di warê denganiyê de zehmetiyek di lêvkirina vê kîteyê de çêdibe, nemaze ku rayeka lêkerê bi rengî "gîr" be,

li vir astengî bêtir dibe ji ber ku "r" tîpeke lerzîner e û di kêşanê de derxistina vê kîteyê zor dibe.

Mînak: Tu digîrî (dema niha)

Ew gîriye (dema boriya dûdar)

Di temambûna mijarê de min divêt bidim diyarkirin ku ez ne mamosteyê ziman im û dibe ku ev gotar li gorî ravekên zimanzaniyê bi qisûr be, anku li gorî pêzanînên xwe yî normal min ev nivîs daniye.

Bi hêvî me ku di nêzîktirîn dem de rêzimaneke têr û tekûz li nav me peyda bibe.

Dermanê Xwezayî

Azad - A.Z.X

Dema têghiştin û pênasekirina zimanekî, ne bi awayekî xwezayî be, dê xwendin û nivîsandina wî jî ne şîrîn be.

Piraniya Kurdan bi ron û zelalî, bi xwendina zimanê dagîrkerên xwe tênagehin. Ta bi zimanên cîhanî jî.

Zimanê biyanî ji Kurdan re, ne zimanekî xwezayî ye. Ji ber vê sedemê civaka Kurdî, ne civakek xwendinhez e.

Bo nimûne: Dema mirov pirsa pênaseya peyvekê zimanî, ji wateyên zimanên biyanî, ji kurdek rewşenbîr û xwenda dipirse, nikare bi awayekî ron û zelalî şîrove bike. Lewra piraniya Kurdan ne xwendinhez in. Kurd bi zimanên olên xwe bi awayekî zanistî, bi felsefî têna gihin.

Çi gelên cîhanê heyîn, bi xwendin û nivîsandina zimanê xwe yî, normal û xwezayî pêş diketin. Bi hezaran pirsgirên xwe yê civakî û ramyarî (siyasî) çareser kirin.

Kurdan jî zimanekî xwe yê xwezayî û normal heye. Piraniya Kurdan zimanê xwe, bi awayekî zanistî nizanin. Kurd nikarin bi şêweyekî zanistî û felsefî, bi hev re biaxivin û danûstandinê bikin. Gorî vê serdema pêşketî di her aliyê jiyanê de ,piraniya mirovên Kurdî li paş mane. Ji ber ku Kurd zimanê xwe naxwînin, lê xwedî dernakevin.

Zimanê her gelî, dermanê zanîna wî ya xwezayî ye. Çi xwendevan û rewşenbîrên Kurd ên bi zimanê kurdî, dixwînin baş zanîn di hiş û bîrên xwe de bi ronahî wergirtiye, cuda ne ji xwendevanên bi zimanên biyanî dixwînin.

Ev hestpêkirin li ser ziman, bi şêweyekî felsefî."Dermanê xwezayî" Her tişt xwezadar e, her tişt bi sirûşta xwe ve vedijî. Her hêvî, her xwestin. Her zanîn, viyan, jiyan, newazî, ronahî, û her şadûmanî. Vedigere li xwezaya xwe yî sirûşt.

Xweza dibe dermanekî çaresaz, ji tînbûn, tarîbûn, zanîn, zanînxwestin, bêrîkirin, xwezî, û ji jankêşan û nexweşiyên xwe re.

Dema kesek li ber tîna rojê, gerim bibe. Li biyabanê ziwa bibe, dê ew mirov gellekê tîn û ziwa bibe.

Lê dema hat û da wî, wê, tînziwabûyî, ça, şîr,xweşav şîr û kakaw, cehav û şîrav. Dema wî wê, vexwar, ma dermanê tînbûna wî, wê ew vexwarine? Ma dermanê tînbûna wî wê, çi ye ?? Helbet, dermanê tînbûna wî, wê av be , aveke zelal û sar e !.

Lê dema kesek di tariyê de winda bibe, li çirûskek ronî bigere.Helbet dermanê tarîbûna wî, şewq û ronahî ye!.

Lê dema kesek dîlgirtî be, ew ê ji rizgarbûna xwe re hewesdar be.Helbet, dermanê dîlbûna wî, wê azadî be!.

Lê dema welatek ji hezar salî ve, dagîrkirî be, bindestê dijmin be, gelên wî welatî, çirûska azadiyê nedîtibin, helbet, dermanê dagîrbûna wî welatî, serxwebûn e !.

Lê dema kesek nezan bimîne, bi zimanê xwe hîn nebe, lê dema hat û ew da hînkirin, bi zimanekî biyan û ne hevxûyî.

Wekî : Zimanê Ingilîzî, Hindî, Erebî,Farisî,Firinsî. Ma dermanê nezanbûna wî, wê zimanekî biyan û ne hevxûyî be?

Helbet, dermanê nezanbûna wî, wê zimanê wî yê zikmak û xwezayî be !.

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Mêrê Çavnebar

Mêrek bijin hebû her dem jiyana xwe û hevjîna xwe dida ber hev û bi dilgiranî diponijî, ji ber wî her û her bi çavnebarî û hesûdî li jiyana hevjîna xwe dimeyzand, wî ji xwe re digot ew jin her dem li malê vehêsayî ye û tu karê zehmet jê nayê xwestin.

Carekê hevalekî wî çirayek bi diyarî dayê, ew çira Cinê Pêkanîna Hêviyan jê derdikeve, her tiştê jê tê xwestin bê dudilî pêk tîne.

Mêrê çavnebar bi kêfxweşî diyariya hevalê xwe wergirt, û bilez berê xwe da malê, dema çira xwe firkand Cinê Hêviyan jê re derket, cinê wî bi rêzgirtin jê re got:"Padîşahê min ê payedar, ez li ber te amade me , fermana xwe bide da ez di cih de pêk bînim".

Mêrê çavnebar bê ku dirêj birame xwesteka xwe got:

Xwesteka min ew e tu du rojan tenê jina min bike mêr û bihêle ew wek jiyana rojane ya mêran bijî , û min bike jin da li malê bi rihetî bimînim .

ji ber ku jiyana jina wî dabû dilê wî , wî ji xwe re bi dilêşî digot, ev jin sibê ta êvarî li ser Fêcebookê ye, yan paldayî ye, yan li civata cîrana ye, wensa xwe bi xwarina dendikan û vexwarina çayê tîne, û dawiya şevê li ser rûpelê xwe yê Fêsbookê dinivîse ...EZ WESTYAYÎ ME.

Min bike jin da ez tiştan bi dilê xwe ji mêrê xwe (jina xwe) bixwazim, welleh vê kezeba min werimandiye, hingî xwestekên wê pir in, da ez heyfê jê hilînim , û ez têr herim sûkan û peran bi dilê xwe xerç bikim û ew ji ku tîne bila bîne .

Cinê wî bi kêfxweşî got: Tenê ev? li ser herdu çavan, xwesteka xwe wek pêkhatî bibîne.

Cihên wan bihev hatin guhertin û ew bû jin û jina wî bû mêr.

Di roja yekem ji jiyana wan ya nû de , jin(mêr) serê sibê zû ji xew rabû berî her tiştî haziriya taştiya zarokan kir û ew ji xew rakirin û ew şandin dibistanê , paşî bang li mêrê xwe (jina xwe) kir, berî taştê qehwak jê re çêkir, cilên wî utu kirin û taştê dayê û mêrê xwe (jina xwe) şand karê wî, paş re cilê xwe li xwe kirin û berê xwe bilez da bazarê da karûbarê firavînê bike, ma heyirî ka wê çi firavînê çêke , gelo ez filan xwarinê çêkim wê bi dilê mêrê min(jina min) be, gelo wê zarok gazinan ji vê xwarinê nekin, dawî tewkeliya xwe bi xwedê anî xwarinek bijart texmîn kir ku bi dilê tevan be, firavîna xwe çêkir zarok ji dibistanê vegeriyan , xwarina xwe xwarin , paşî mêrê wê jî hat (jina wî) firavîna wî jî dayê û mêrê wê çû hinekî danê esrê ji xwe re raze, wê(wî) berê xwe da mutfekê kel û pelên xwarinê şûştin piştî se'etkê mêrê wê ji xew rabû , hê çavlixew çayê xwest, çaya xwe bi lez vexwar û berê xwe da çayxanê da bi hevalên xwe re biwenise û heta derengê şevê li wir qedand.

Dema mêrê wê (jina wî) dereng vegeriya malê , çû bi kêfxweşî derî jê re vekir , bi hisret li bena çend gotinên xweş ma ku mêrê wê (jina wî) jê re bêje, lê çi qewle û çi behse, yek gotina xweş ji devê wî derneket, gotinên wî tev gilî û gazin û xwestek bûn û çêkirina şîvê jî jê xwest, dawiya şevê dema razana, cilên xweşik ji mêrê xwe re(jina xwe re) li xwe kirin, xwe kil û neynik kir û şeva xwe bi evîndarî derbas kirin.

Bê ku em hûrgiliyên roja diwem jî bêjin jina pepûk (mêr) roja xwe ya din jî bi wê merezdariyê qedand.

Herdû rojên bazara wî û cinê wî bi dawî bûn... bi bîntengî çira xwe careke din firkand , cinê wî jêre derket û xwe ji xizmeta wî (wê) re amade da xuyakirina .

Cin bi dilovanî got :" xatûna min a hêja .. ez li ber destê te me .. ez xizmetkarê te me.. bêje .. tu çi fermanê didî".

Wî li cin vegerand; zû min vegerîne wek berê berî ez ji qehra û westanê bimirim , ma ne tu cinî ?.. tu her tiştî dizanî, ma te şîretek li min nekir, te nego ev kar ji te re ne lazim e , zû min vegerîn wek berê , ez dest û lingên te maç dikim"

Cinê wî bi ken lê vegerand û got , mixabin , ez lêbûrîna xwe ji te dixwazim, ez her tiştê dinyayê dikarim bikim , ji bilî ez te vegerînim wek berê, ji ber ku min peyman û sûnd ji Saziya Çavdêrî Û Parastina Zarok Û Jinan re xwariye, ez ticarî jiyana kesî ji wan bidawî nekim .

Ez nikarim te vegerînim mêraniya te ya berê, heta 9 heyvên te temam nebin , ji ber tu bi halekî yî.

Ramana sikêtçê ji postekî Ciwan Temo yê fêsbookê bi zimanê Erebî ye

Şiyar Silêyman

Di Dema Serxwebûnê De.. Koletî

Şêrko Ebdulrehman

Ger ku peyva koletiyê bilêv bibe, hişê mirov diçe li ser peresgeh, pût û peykeran. Lê belê têgeha koletiyê vê yekê derbas dike, çimkî hevkariya mêrê bi hêz, şaman û mirovê şareza hişte ku mirovên kole ji koletiya xwe hez bikin û bi rengên cuda bixemilînin. Di vir de ez ê tenê behsa cûreyeke koletiyê bikim; ew e koletiya çanda dagirkeran. Mixabin koletiya dagirkeran gihiştiye hestiyên netewên bindest. Mînaka min a berbiçav beşek gelê Kurd e, em dibînin ku hejmareke ji vî gelî ta roja îro di bin bandora dagirkeran de ne. Û bi awayekî bel û beloq çanda dijmin, dagirker, û zordarên xwe; dipejirînin! Bi taybet jî zimanê dagirkeran, rê û rêbazên wan ji xwe re bingeh digirin. Qaşo li Rojava sê zimanên fermî hene; Kurdî, Erebî û Suryanî, lê mixabin di bin sîwanên her sê encûmenên fermî de tenê zimanek tê pejirandin ew jî zimanê erebî ye!! Hin kesayetin berpirsyar ji min re gotin ku di encûmena rêveber de derfet nehatiye dayîn ji bo axaftina bi zimanê dayikê yê Kurdî. Lê hemû spasî bo Xudan re ku di bin îsrara wê kesayetê de mijara xwe bi zimanê xwe berdewam kir!. Her wiha di Encûmena Zagonsaz de pirsiya axaftinan bi zimanê erebî ne. Ev yek li ser daxwaza pêkhateya ereb û suryaniyan bû. Lê mixabin di rûniştina dawî de (ya meha 1ê ji vê salê) hin Kurd jî xwedî li çanda ereban derketin û tevlî pêkhateyên din bûn û xwestin ku axaftin tenê bi erebî be. Her wiha werger jî nepejirandin bi hinceta ku wate û werger hev û dû nagirin. Rast e ew tecrubeyeke nû bû, û kêmaniya wê bêguman hebû lê belê nepejirandina wê bi vî awayî, koletiya rewşenbîrên Kurdan diyar dike, ez naxwazim bêjim ehmeqî jî! Dema ku rewşenbîr rewşenbîr, dibe rewşenkwîr! Ez nizanim rewşenbîrên me ta çi astê nûnertiya çanda gelê xwe dikin. Lê di baweriya min de ne cilên Kurdî têra welatparêziyê nake bi taybet ger ku ew cil bi darê zorê hatibe sepandin, çimkî pêşkêşvanên (spîkerên) televizyonên Rojava bi cilên Kurdî li ser ekranê derdikevin lê belê biyanî bûye ku beşinedi kolan û encûmenan de cilekî dîtir li xwe dikin! Ev nakokî ye pêwîst e bi zelalî em lê binêrin. Em li Rojava ne, lê Rojava ne navekê bêyî raveke! Raveka wê Kurdistan e. Kurdistan jî mîna pûtekê di çavên Kurdan de ye, ger ku pûtê me hebe wê Kurdistan be, erdnigariya Kurdistan, xêr û bêrên wê, çanda wê, mirovên wê, gulên wê, çiyayên wê û hemû mîrateyên wê. Lewma zimanê Kurdî ji bo hemû Kurdan cihê şanaziyê ye.

ÇAND(1-3)

Çanda bi Ç'ya mezin dest pê dike (CULTURE / KULTUR) gellek tiştan dixe nav xwe, ji babetên xwarinê bigir ta berhemên wêjeyî. Bi gotineke din, Çanda neteweyeke wek ya almanî ji babetên xwarinê yên wek Bratwurst û Sauerkraut bigir ta berhemên mûzîkî yên Beethoven, û ji toreyên civatî bigir ta berhemên Goethe û Şiller dixe nav xwe. Di Almanya ya îroj de mirov dikare xwe bi hêsanî bigihîne agahiyên derbarê hemî beşên Çanda neteweyî ya gelê almanî de. Çanda almanî di pirtûkxaneyan de, di entîkxaneyan de, di kelayan de, di kilîseyan de û di şûnên bîrhanînê de zindî ye. Li van şûnan mirov xwe bi rêya pirtûkan, belavokan, nivîsaran, şop û nexşe û lidûmayînan dikare ne tenê derbarê Çanda dehsal û sedsalekê de lêbikole, lê derbarê ya bi sedan salên di dîroka gel û neteweya almanî de. Dema mirov xwe di nav leheya agahiyên derbarê Çanda neteweyeke wek ya almanî de dibîne mirov xwe wek kurdekî biçûk hest dike û di heman demê de dilşkestî bi ser rewşa Çanda gelê xwe de digirî.

Çanda gelê kurd yeke kûr û berfireh bû û heta ber 50 salan jî milletê kurd bi gellek awayan ji milletên dirawsê (cînar) cuda bû, lê bi derbasbûna demê re wek berfa li ser çiyayekî bihele, Çanda kurdî her ku çû ji dewlemendiya xwe wenda kir. Di demên par de milletê kurd bi pirranî bi saya mayîna li herêmên xwe û axaftina zimanê xwe ta radeyeke bilind ji asîmîlasyonê (helandina di nav komên din de) hatibû parastin. Lê bi mezinbûna bajaran û zêdebûna hejmara xwendekarên di xwendegehên ku zimanên wan ne kurdî ye re, asîmîlasyon jî berfirehtir bû. Li bervaciya rewşa gelên ku bi kêmasî dêrên wan xwedî li ziman û çanda wan derdiketin, kurd bi pirranî musilman bûn û ola wan li şûna ku ziman û çanda wan biparêze ew bêhtir ber bi asîmîlasyonê ve gêr kirin, çimkî ayet, nimêj, azan û heta bi pirraniya navên kesan be bi erebî bûn. Îroj ziman û çend taybetmendiyên (xusûsiyat) Kurdan ne tê de, çi şanên rêkûpêke ku gelê kurd rast ji gelên dirawsê cuda raber bikin li holê nînin. Eger xweliya demê û çerxa felekê zimanê wan jî ji holê rake ji bilî navê "kurd" tiştek ji wan re namîne. Bi taybetî di nav 50-60 salên derbas bûnî de Çanda kurdî beşekî rengînî mezin ji xwe wenda kir; wenda kir ji ber ku nehat parastin, ne di jiyana rojane de, ne jî bi nivîs. Ji ber ku Kurdan dewlet nebû, ji ber ku stemeke bêhûde li ser wan û çanda wan hebû, û ber her tiştî ji ber ku gelê kurd (bi taybetî Kurmanc) bi pirranî nexwende bû û ne xwediyê derfetên qeydkirin û parastinê bû, Çanda kurdî di gellek beşên xwe de heliya, ket nav çandên din, ji çendên din xist nav xwe, yan hîşt ku beşine wê bi ber reşebayê dem û dewranê kevin. Di nav sedsalên çûnî de bi hezaran mîr û beg û zanyar û navdarên Kurdan mirin û şopa li dû gellekan ji wan mayî wenda bû. Bi saya stranên gelêrî navên çend kesan man, lê rastiya tevahî û agahiyên rêkûpêke derbarê wan û dewrana wan de hatin jibîrkirin. Bi hezaran gund û bajarokên Kurdan hatin û çûn bêyî ku şopeke pêbawer li dû xwe bihêlin. Heta bi şoreşên demên par be, belgehên pêbawer derheqê tevahiya mijarên xwe bi wan ve girê didin de bi şêweyeke rêkûpêk nehatin nivîsandin, yan bi carekê ve li holê nebûn; û va yeka bû egera xarkirina agaihiyên derbarê wan de, hem ji aliyê dewletên serdest û hem ji aliyê Kurdan bi xwe ve. Hema jiyana koçerên kurd, yan ewên ku pez xwedî dikirin bidin ber çavan. Şêweya jiyana wan, peyvên wan bi kar dihanîn, çanda bêrîvaniyê, şîrkilandinê, çortançêkirinê, mûhûnanê, tevnristinê, dewarçêrandinê... bi seri û binê xwe ve bêyî nivîsandin û tomarkirin man. Cil û bergên kurdî yên deveran, palas û kulav û xaliyên ku Kurdan li deverên cuda çêdikirin, xwedîkirina lawiran, şêweyên nêçirvaniyê û gellek tiştên din ku Kurdan xwe bi hezaran sal bi wan ve mijûl kiribûn neketin entîkxaneyan û pirtûkxaneyan. Eger li hinek şûnan ketibin wan jî, ewdi bin navên Çandên neteweyên din de ne. Çend berhemên bi sînor yên wek Şerefname ne tê de, hinek ji wan ne bi kurdî, bi saya çend nivîskar û lêkolerên biyanî bûye ku beşinedi biçûk ji şopên kevnar yên Kurdan di pirtûkên bi zimanên din de mane, yan ji wan hatine wergerandine. Hema navên mit û keskahî û pincara ku di nav 50 salênwê, mirovên wê, gulên wê, çiborîn de, bi encama berfirehbûna çandiniyê û sedemên din wenda bûnî bide ber çav,

Shahînê Bekirê Soreklî